

PAPER DETAILS

TITLE: Sê Tezên Mastera Kurdî Yê Ku Li Zanîngehên Tîrkiyeyê Hatine Amadekirin -1-

AUTHORS: M Zahir Ertekin

PAGES: 126-133

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/392529>

SÊ TEZÊN MASTERA KURDÎ YÊN KU LI ZANÎNGEHÊN TIRKIYÊYÊ HATINE AMADEKIRIN -1-

M. Zahir ERTEKİN¹

Li Tirkîyeyê xebatên derbarê ziman û edebiyata kurdî yê akademîk de bi beşên ziman û çanda kurdî dest pê kirin. Beşa ziman û çanda kurdî cara yekem li Tirkîyeyê di sala 2009an de bi biryara lîjneya wezîran a Tirkîyeyê di binê enstîtuya zimanên zindî yê Tirkîyeyê de tevî beşa ziman û çanda suryanî û erebî li Zanîngeha Mardîn Artukluyê vebû û di 2010an de dest bi perwerdehiya lîsansa bitez û bêtez kir. Herwiha enstîtûyên heman rengî li çend zanîngehên din jî vebûn û wan jî bernameya mastera kurdî damezrandin, meşandin û hê jî dimeşînin (Zanîngeha Bîngolê û Zanîngeha Yuzuncu Yıl ya Wanê). Li aliyekî din di hin zanîngehan de jî mastera kurdî di bin siwana enstîtûya zanistên civakî de tete meşandin (Zanîngeha Muş Alparslan û Zanîngeha Dicleyê ya Diyarbekir).

Tevî masterê li sê zanîngehan lîsansa kurdî jî vebûye û hê jî ev beş bi awayekî aktîf perwerdehiyê didomînin. Li Artukluyê îsal (2017) dê cara sêyem mezûn derbiçin û di zanîngeha Bîngolê de jî îsal dê yekem qefleyên kurmançî û zazakî (2 beş-2 pol) mezûn bibin. Herwiha îsal beşa kurdî ya Zanîngeha Muş Alparslanê dê yekem xwendekarên xwe mezûn bike. Di Zanîngeha Dêrsîm de tenê lîsansa Ziman û Edebiyata Zazakî heye. Li Zanîngeha Sêrtê û Batmanê enstîtuya zimanên zindî vebûye lê çalak nînin.

Piştî van agahiyên xweş, xweşxeberek jî di warê doktorayê de heye. Lewra di 2015an de zanîngeha Dicleyê yekem car doktoraya kurdî vekir û 6 xwendekarên doktorayê wergirtin. Perwerdehiya wan berdewam dike. Piştî vê gava girîng di 2016an de bi hevkarî û şîrîkatiya du zanîngehan (Muş Alparslan û Bîngol) bernameyeke din a doktorayê jî vebû. Di vê bernameyê de heta niha carek

1 Dr. Zanîngeha Bîngolê, Dersdarê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî. zahirertekin@hotmail.com

xwendekar hatine wergirtin. Ji bo zazakî 5 ji bo kurmançî jî 7 xwendekar nika xwendina xwe berdewam dikin. Ji bo doktorayê heta niha mezûn derneçûne, lê hin xwendekar serdemên dersan kuta kirine û bi nivîsandina tezên xwe re 'eleqedar in. Ji bilî van du bernameyên doktorayê, bernameyeke din a doktorayê jî heye. Bi hevpeymaneke di davbera Zanîngeha Mardin Artukluyê û Zanîngeha Zaxoyê de, hin wanebêjên beşa kurdî yê Artukluyê li beşa kurdî ya Zanîngeha Zaxoyê doktorayê dikin. Hêvî heye 4-5 ji van wanebêjan îsal (2017) dê bi awayekî serkeftî vê bernameyê biqedînin, bawernameyên xwe werbigirin û bibin doktorên kurdî.

Herwiha YOKê di sala 2015an de yekem car li ser sîstema UAKê di bin navê *Yaşayan Dünya Dilleri* (Zimanên Zindî yê Cîhanê) doçentiya kurdî vekir. Weke ku tête zanîn salê du caran serlêdana doçentiye vedibe. Li gorî agahiyên ku em pê dizanin, ji bo doçentiya kurdî cara 'ewil (Cotmeha 2015an) sê kesên û cara duduyan jî (Nîsana 2016an) kesekî serî li doçentiya kurdî daye. Em hêvîdar in ku ev endamên doçentiya kurdî dê bi ser kevin û gaveke giring a ku bibû asteng li ber akademiya kurdî vebe û pileya akademiya kurdî jî li Tîrkiyê berzetir bibe.

Piştî vê kurtepêvajoya akademiya kurdî ya li Tîrkiyeyê, em werin ser nivîsa xwe. Di vê nivîsê de meqseda me ev e ku li sê zanîngehên ku mastera kurdî dimeşînin de bi tevahî sê tezên kurdî derxin pêş çavên lêkolanan. Ji her zanîngehekê em dê tezekê bidin nasîn. Ev zanîngeh jî ev in: Mardin Artuklu, Bîngol û Muş Alparslan. Armanca me ev e ku tezên kurdî tenê di pirtûkxaneyên zanîngeh û enstîtûyan de nemînin û xwe radestî 'eleqedar û xwîner û xebatkarên vê qadê bikin. Ji ber vê yekê divê yan ev tez bêne çapkirin yan jî bi danasîn û şîroveyan çapkirî (çi çapên dijîtal çi çapên kaxezî) qada vekolînê re aşkera bibin. Helbet her kes nikare teza xwe çap bike û bigihîne ber destê raya giştî, nemaze ber destê peywendîdaran. Lewra him weşanxaneyên kurdî lawaz in û him jî her amadekarê tezekê, bi karê zehmet re bi tena serê xwe nikare mijûl bibe. Helbet çend ji van tezan hatine çapkirin lê piraniya wan hê jî nehatine çapkirin. Ji bo vê yekê jî me xwest ku em quncikekê di vê kovarê de ji bo danasîna tezên kurdî vekin.

Li vir divê em vê jî bizanin ku yekem teza masterê ya kurdî li zanîngeha Artukluyê derçûye. Tez di bin serperîştîya *Kadri Yıldırım* de hatiya amadekirin. Navê tezê *Folklorê Kirmancan (Zazayan Kirdan/Dimilîyan) Ser o Cigêrayîşê* ye û amadekarê tezê *Nadire Güntaş Aldatmaz* e. Tez di sala 2013an de hatiye amadekirin. Tez li ser folklorê kirmancan/zazayan hatiye amadekirin. Piştî vê tezê derî li vê qadê vebû û bi dehan tez bi serkeftî derçûn. Ev 'eleqe û hahîşkarî hê jî berdewam e. **Li gorî tespîten me jî sala 2013an û heta 2016an li Zanîngeha Mardîn Artukluyê 72, li zanîngeha Bîngolê 26, li Zanîngeha Muşê 8, li Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê 12 û li zanîngeha**

Dicleyê 4 tezên kurdî derçûne.² Bi dehan tez li ber qedandinê ne, gelek xwendekar tezên xwe dinivîsîn û yên ku serdema dersan de ne jî hene. Hasilê kelim dewlemendiyeke veşartî heye di vê qadê de. Loma me xwest ku em jî keda wan mamoste-muşrîf û amadekar-xwendekaran bi bîr binin û cî bidin tezên wan di kovareke muhekkem de.

Îja dixwazim derbasî sê tezên cihê bibim ku me jî vê deryaya biçûk bijartine. A ‘ewil jî zanîngeha Artukluyê ye. Ji ber ku keda wan zêdetir e û ew qedîmtir in.

1. Temaya Sirgûnê Di Çar Romanên Kurdî(kurmançî) de

Amadekarê tezê *Davut Yeşilmen* e. Şewirmendê tezê *Hayrullah Acar* e. Tez di sala 2014an de di bin banê *Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê* ya zanîngeha Artukluyê de hatiye pejirandin û 163 rûpel e. Temaya sereke ya tezê sirgûnmeftî/mefîtî wêjeya sirgûnê ye. Mijar bi edebiyata modern a kurdî re têkildar e. Çawa ku tête zanîn di nav xwendekarên kurdî de herî zêde romanên kurdî tene xwendinê. Lewra him mijar û him ziman û him jî karakter di vê cureyê de bêtir bala xwîneran dikişîne. Loma jî roman di edebiyata kurdî ya nûjen de cihêkî taybet werdigire. *Yeşilmen* jî di nava bi sedan romanên kurdî de çar romanên balkêş bijartîye û wêjeya sirgûnê ji hundirê wan kişandiye, tehlîlên edebî li ser wan kiriye. Sirgûn ji xwe re kiriye bingeh, roman mal e û edebiyat jî şûr û mertalên wî ne, di tezê de. Tez xuya ye ku wê zêde bala xwendevan û lêkolanan bikişîne. Lewra him edebiyat e û him jî sirgûn e û kurd bi vê bêjeyê û bi vê bûyerê re zexim rûbirû mane. Kurd diwariyên sirgûnê baş dizanin. Loma di romanên de jî bûye mijareke sereke. *Yeşilmen* têkiliya sirgûn û bijartina wê ya ji bo teza xwe wiha rave dike: “Di vê maweya ku kurd di serdemên nû yên jiyana sirgûnê re derbas dibûn û di jiyana wan a sirgûnê de guherîn diqewimîn, motifên sirgûnê di wêjeya wan de çawa cî digire, gelo jiyana sirgûnê li ser nivîskar û berhemên wan bandoreke çawa hiştiye û jiyana sirgûnê di berhemên wan de bi çî awayî hatine nîşandan, herweha vê jiyana sirgûnê berê pêşveçûna wêjeya kurdî û modernîzma kurdî ber bi ku ve biriye? Bi taybetî di romanên ku ji bo tezê hatine hilbijartin de ev yek bi berfirehî hatin analîzkirin. Ji bo vê yekê pênasikirina têgeha sirgûnê û di heman çaxê de di dîroka Kurdistanê de mînakên siyasî û wêjeyî yên sirgûnê hatin şîrovekirin.”

Yeşilmen di puxteya teza xwe de armanca teza xwe wiha rave kiriye:

“Armanca pêşîn a vê teze, bi çar romanên wêjeya kurdî ya modern re raçavkirin û analîzkirina têgeha sirgûnê ye. Herwiha di vê xebatê de fêmkirina jiyana sirgûniya kurdan ya ji salên 1980yî heya roja me armanceke din e...”

Pênasekirina têgeha sirgûnê yek ji armanca vê xebatê ye. Ji ber ku hem weke pênasekirina vê têgehê û hem jî sînoren vê têgehê di wêjeya kurdî de,


2 Aykaç, Yakup; “Bibliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê yên li Tirkîyeyê (2011-2016)”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C:2/1, Zivistan 2017, r. 2.

riya vekolîna wêjeya kurdî ji hêla xebatên tematîk ve vedike. Di vê tezê de bi mînakên wêjeya cîhanê û veçirîna vê têgehê re, em giringiya sirgûnê di wêjeya cîhanê de dibînin. Bi mînakên ji welatên sereke re tê dîtîn ku nivîskarên ku mohra xwe li wêjeyê dane, piraniya wan di heman çaxî de nivîskarên sirgûnê ne jî. Ji destpêka wêjeya kurdî heya van demên dawî, ji bo wêjeya kurdî jî her wisa bûye.”

Romanên ku bûne mijara vê tezê jî balkêş in. Him ji aliyê mijarê ve wekhevîyek heye, di nava wan de. Him jî navên ku hatine hîlbijartin balkêş in. Lewra dudu ji Kurdistana Sûrîyeyê ne, dudu ji Bakur in. Em nizanin bê ka Yeşilmen çima ji her parçeyekî yek nebijartîye. Yekîtiyeke van nivîskaran jî ew e ku hemûyan romanên xwe li Swêdê (Ewropa) nivîsandine û her çar jî bi taya sirgûniyê ketine û ev êş kişandine. Ew romanên ku bûne mijara vê tezê ev in: *Barê Şevê* ya Fawaz Husên, *Payîza Dereng* a Firat Cewerî, *Pêlên Bêrikirîna* ya Mustafa Aydoğan û *Tîrsa Bê Diran* a Helîm Yusiv.

Yeşilmen rêbaza vekolînê wiha destnîşan dike: “Di warê analîzkirina çend romanên kurdî de rêbaza me ev bû ku roman bi çîrok û karakterên xwe ve jiyana sirgûnê rave bikin. Bi vê armancê re di her romanê de pêşî li ser çend hêmayên naverokî hate rawestan. Ji hêla vebêjer, nêrîn, karakter, tevna çîrokê, dem û mekanê ve, bi awayekî giştî roman hatin analîzkirin. Di beşa duyemîn a analîzkirina romanên de jî em bi hûrgulî li ser hêmayên sirgûnê weke sedemên sirgûniya karakteran, rêwîtiya ber bi warê sirgûnê ve, ravekirina welat û bajarê sirgûnê, di jiyana sirgûnê de evîndarî, avakirina karakterên jin, derûniya li sirgûnê, bindestî û bêdewletbûna karakterên sirgûn û vegera wan a welêt rawestîyan.”

Tez ji 3 beş û encamê pêk tê. Di beşa yekê de, ji hêla binyadî û civakî ve sirgûn hatiye nasandin. Sirgûnî çi ye, cure û sedemên sirgûnê çi ne û çi bandor li ser derûniya mirovan hiştiye? Ev pirsên sereke ne ku nivîskar di beşa ‘ewil de li ser wan sekiniye. Di beşa duyem de xebatkarê tezê dîrokçeya jiyana sirgûniyê di wêjeya kurdî de daniye ber xwe. Di vê beşê de destnîşan kiriye ku berê sirgûnên siyasî sirgûnên edebî hebûne. Rewşenbîrî û edebiyatnasiya ku bi saya serê sirgûnê ve pêşketiye, rewşa edeba kurdî ya li sirgûnê, xasma ya li Ewropayê û Kafkasyayê û romana kurdî û sirgûnî deqên sereke yê wê beşê ne. Di beşa sêyem de ku kakila tezê bixwe ye,



amadekarê tezê çar romanên çar romanûsan li gorî hêma, vebêjer, nêrîn, tevna çîrokê, dem, mekan, karakter û gelek hêmayên sirgûniyê xistiye binê destarê vekoleriya xwe û hêraye. Bi seredorî wî ewil romana Fawaz Husen, paşê ya Firat Cewerî paşê ya Mustafa Aydoğan û herî dawî jî ya Helîm Yusiv nîrxandiye. Di vê beşê de bindestî û vegera welat jî ji her çar romanên hatiye derêxistin. Derûniya sirgûniyê bi çî awayî di zêhna nivîskarê romanên de keliyaye û bi çî rengî herikiye ser rûpelên romanê, bi analîzên kûr û fireh hatiye rave kirin.

Çend encamên ku *Yeşilmen* bi vê xabatê xwe gihandiyê ev in:

Romana kurdî ya sirgûnê kevneperest e, depresîf e û dest nade hêlên nazik yên civakê an kesayetiye. Pirsgirêkên wan, ew pirsgirêk in ku ji civakên kevneperest ve maqul têne dîtîn. Di dawîya romanên de tenê dilê xwendevanan bi wan dişewite. Di vî halî de jî, bi romanên sirgûnê dirûvekî nû li romana kurdî dikeve. Hem di warê teknîkê de hem jî di warê rabêja romanê de, riyên nû li ber romana kurdî vedibin. Bi awayekî zelal, dîroknûsiya serdemên nû û trajediyên kurdan vedibêjin. Di romana *Tîrsa bê Diran* de hem şertên Rojavayê Kurdistanê yên salên nêzîk têne vegotin hem jî bi riya karakterên romanê, hesabê sedsalekê yê Kurdistanê tê pirsîn. Di romana *Barê Şevê* de jî bi riya çar karakterên ji çar perçeyên Kurdistanê, rewşa kurdan a ku dişibe hev, tê vegotin. Ev vegotin weke yekqederiya kurdan dikare bê xwendin.

Dema ku em berê xwe didin çavkaniyên tezê em dibînin ku çavkaniyeke dewlemend hatiye amadekirin. Xasma jî hêla teorîyê ve gelek çavkaniyên sereke yên biyanî bûne bingeş ji tezê re. 6 rûpelên tîrê jî bo çavkaniyên tezeke masterê şanazî û serkeftinek e.

2. Eqîdenameya Zazakî Yê Mela Mehemedê Hezanîyî (Metno Transkrîbekerde, Wekenitiş û Açarnameyîş)

Amadekarê tezê *Metin Çiftçi* ye. Şêwirmendê tezê *Nusrettin Bolelli* ye. Tez di sala 2015an de di bin banê Enstîtûya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê de hatiye peşkirandin û 75 rûpel e. Tez zazakî hatiye amadekirin. Mijara tezê eqîdenameya menzûm a zazakî ya Mela Mihemedê Hezanî ye. *Çiftçi* di vê xebatê de metnê destnûsê ê tezê veguheztiye ser alfabeya latînî, lêkolîneke 'ilmî li ser wê kiriye û wergera wê ya tirkî jî lê zêde kiriye. Bawername ji 144 malikan pêk tê û di heman rûpelê de dîsa li gorî wezn û kêşeya helbestê, tirkîya wê jî hatiye bicihkirin. *Çiftçi* di kilmvateya teza xwe de armanca xebata xwe wiha şîrove dike: "Ina xebat, esero menzûm yê Mela Mehemedê Hezanî ke serra 1980 de bi nameyê *'Eqîdetu'l-Îmanî* nusîyayo ser o hadre bîya. In tez destpêkêk, hîrê qisimî, metno transkrîbekerde û açarnayîşê eqîdenameyî bi tirkî ra yeno meydan..." di dawiyê vê puxteyê de *Çiftçi* daxwaziya xwe ya xebatên di vî warî de wiha berdewam dike: "Ma wazenî bi ina xebata ke xebatanê tewr verînan yê tewirê eqîde yê edebîyatê zazakî ser o benî ra yew a, hem inî eserî bidin şînasnayîş û hem zî ma hêvî kenî ke seba avêşîyayîşê zazakî yew havila ma

bibo.”


Tez ji destpêkekê, sê beş, werger û transkrîpsiyona bawernameyê pêk tê. Weke ku *Çiftçi* jî amaje pê dike di destpêkê de li ser edebiyata klasîk a zazakî û cureyê bawernameyan hatiye rawestîn. Di beşa yekê de jiyana Mela Mihemed, berhemên wî, kesayetiya wî ya edebî hatiye vekolîn. Beşa duyem de bawername ji layê şiklî ve hatiye tehlîlkirin û di beşa sêyem de jî naveroka bawernameyê, zimanê wê, teşe û rêbaza nûsîna wê hatiye kolandin. Piştî beşa sêyem latînkirina bawernameyê tevî wergera wê ya tirkî hatiye amadekirin. Li ser dabeşkirina tezê, *Çiftçi* wiha qise dike: “Qismê detspêkî de mewzû, armanc û ûsulê xebat îzah bîy. Qismê yewin de; cuye, eserî, şexsîyeto edebî yê nuştoxî û derheqê zazakî(kirdkî) de fikranê ey ra behs bîyo. Qismê diyîn de, menzûme hetê şeklî ra, qismê hîrêyin de zî hetê muhtewa ra ameya wekenitiş. In qisim de, teberê muhtewa de eynî wext de ziwan û ûslubê eqîdeyî ser o zî ameyo vindertiş. Peynî de zî eqîdenameyo zazakî bi tirkî ameyo açarnayîş û metno transkrîbekerde zî îlawe bîyo.” Di pêveka tezê de jî *Çiftçi* bi nivîskarê bawernameyê re(Mela Mihemed Hezanî) hevpeyvîneke dirêj diweşîne. Di vê hevpeyvînê de ji gelek aliyên kesayeti û ‘ilmî yê Mela Mihemed pirs û bersiv cih digirin. Sernavê vê îlaweyê ev e: “Roportaj, Derheqê eqîdeyan, zazayan û edebîyatê zazakî de fikrê Hezanîyî”

Ev xebat ji bo qada xwe xebateke sereke ye. Yekem xebata akademîk a li ser bawernameyê zazakî ye. Herwiha bi saya vê xebatê em pê dihesin ku heta niha çar bawernameyên zazakî hene. Bî gotîna *Çiftçi*:

Edebîyatê zazakî de kiştê tewirê mewlidî de yew tewiro bîn zî *eqîdename* yo. Her çiqas edebîyatê zazakî de edetê eqîdenuştîşî esto zî zey edebîyatê kurmançî xurt nîyo û tena çar hebî eqîdeyî estî. Eqîdeyê Hunijî in tewir de nimûneyo verîn o. Hezanîyî zî serra 1979 de dest pê eqîdeya xu kerdo û 1980 de kerdo tamam. Eqîdeyê ke bi zazakî nusîyayî in ê:

1. 1. Mela Mehmed Elî Hunij, *’Eqîdeyî Îman-’Eqîdeyî Îslam*, 1970, 66 beytî.
2. 2. Mela Mehmedê Hezanî, *’Eqîdetu’l-Îmanî*, 1980, 144 beytî.
3. 3. Mela Mehmed Demîrtaş, *Qasîdeya diyîn*, Dîwan, 2006, 52 beytî.
4. 4. Mela Mehmed Muradanî, *’Eqîda Zazakî*, 2005, nesr o, 36 rîpelî.

Çiftçi du xalên girîng ên encama teza xwe wiha rave dike:



Her çiqas zî eqîdeyê Hezanîyî de çekuyê xeribî bibî reyna zî merdim eşkêno vajo ke in eqîde hetê ziwano edebî ra xurt o. Hezanîyî in eqîde qey ewamî nušto inay ra ziwaneke sade şuxulnayo. Heto bîn ra in eqîdename de xususîyetê eqîdenameyanê kurmançî estî. Bitaybetî in eqîdename, hetê vatiş û muhtewayî ra maneno eqîdenameyê Mela Xelîlê Sêrtî yî û hetê vatişî ra zî maneno eqîdeyê Ehmedê Xanîyî. Zey Xanîyî, Hezanî zî eqîdeyê xu bi çarçewaya ruknê îslam û îman ardo pê. Tena Hezanî mewzûyanê bi îxtîlaf ra dûrî vinderto.

Heme eqîdenameyê zazakî hetê ê şexsan ke perwerdeyê medresa gureto ra nusîyayî. Çunke inî melayan hem medresa de eqîdeyê erebkî û kurmançî wendî hem zî wayîrê qebîliyetê nuştîşî yî. Hetê muhtewayî ra hema-hema heme eqîdenameyê zazakî zey pê yê. Tena eqîdenameyê Mela Mehmed Demîrtaşî bi tewirê awan binêk cîya keweno. Zey eqîdeyanê bînan in eqîdename zî qey şîret û nesîhetî nusîyayo in semed ra çekuya “bîzan” zaf şuxulîyaya. Ma bi ina xebat edebîyatê zazakî de hem eqîdeyê Hezanîyî dayo şînasnayîş hem zî warêko newe de yanî tewirê eqîdenameyî de çi eserî estî nê dîyar kerdî û xususîyetê nê eseran ardî zîwan.

3. Jiyan û Kilamên Dengbêj Ahmed Alîksan

Li zanîngeha Muş Alpaslanê di binê rêveberiya *Abdülcelil Bilgin* de ji aliyê *Fehmi Yeşilçınar* ve hatiye amadekirin. Di sala 2016an de qediyaye û hatiye pejirandin, tez tevî pêvekan ji 254 rûpelan pêk tê.

Tez ji du beşan pêk tê. Beşa yekê jiyan û kesayetiya dengbêj *Ahmed Alîksan* bi hûrikî hatiye vekolîn. Beşa duyem derbarê berhemên dengbêj *Ahmed Alîksan* yên ku hatine kom kirin û analîza wan e. Di vê beşê de 19 klamên şer, kuştin û mîrxasiyê, 15 klamên evînê hatine bicihkirin. Klam ji aliyê mijar, leheng, naverok, teşeyê ve yek bi yek hatine nîrxandin. *Yeşilçınar* xebata xwe li qadê kiriye. Bi gelek kesan re rûniştîye û dengê wan qeyd kirine. Herwiha li gundê *Alîksan* bi gelek nas, dost û xizmên wî re têkilî danîne û ji wan îstîfade kiriye. Hevalên *Alîksan* ên dengbêj ên li heyatê jî çavkaniyên sereke yên vê xebatê ne. Xebatkarê tezê di pêveka tezê de bi wêneyên kedkarên tezê, teza xwe dewlemend kiriye. *Yeşilçınar* hevpeyvînan ku bi hevîrê, dost û eqrebyanê *Ahmed Alîksan* re di derbarê kesayet, dengbêjî, zîman û şewaza wî re kirine, hemû di pêveka tezê de bicih kiriye.

Li ser deng û hunera dengbêj *Ahmed Alîksan* ev encam gihiştîye ber destê *Yeşilçınar*:

- *Alîksan* karê dengbêjiyê her tim pêwîst dîtiye. Xwestîye ku dengbêjî her berdewam be. Ji ber vê yekê dengbêjiyê weke karekî pîroz dibîne. Hem şagirt perwerde kiriye him jî xwestîye ku zarên wî jî vî karê pîroz pêk bînin.
- Bi dengêkî cuda karê ku bi xwe pîroz girtî dike. Xwedî dengêkî akûstîk e. Dengê wî bi hunera wî derdikeve asteke bilind. Bêguman dengbêjekî şareza

ye. Hemû taybetiyên dengbêjan nîşanî me dide. Kilam derxistiye û bi terza xwe vegotiye. Wî jî her wekî dengbêjên qedirbilind şahidiya dewra xwe kiriye. Bûyerên qewimî wek kilama Taşlıçay, Werdê û hwd., li bîra dîrokê neqîş kiriye. Alîksan, dengbêjekî gelek bi xîret bûye. Di her fersendê de hunera xwe nîşan daye. Ji bo nîfşên pêş me gelekî girîng e.

Di encamê de em dikarin bêjin ku gelek tez di warê dengbêjiyê de hatine amadekirin. Lê mixabin zimanê vê tezê hineki lawaz maye. Xwezî hinekî din jî bi zimanekî dewlemend hatiba nivîsîn. Herwiha jî aliyê teoriyê ve jî qels maye. Herwiha çavkaniyên biyanî jî pir kêmtir in di tezê de. Dîsa jî hêjayî pesinandinê ye, ku ji devera Sehedê xortekî Serhedî li ser dengbêjekî veşartî yê Serhedî sekiniye û ew jî tarîtiyê rizgar kiriye.

Wekî dawî;

Em di vê nivîsarê de li ser sê tezan rawestiyân ku li sê zanîngehên cihê hatine amadekirin. Yek li ser edebiyata modern e, yek li ser edebiyata klasîk e yek jî li ser edebiyata gelêrî ye. Duda jî wan bi kurmancî yek bi zazakî hatiye amadekirin. Me xwest ku lêkolîner jî van tezan haydar bibin û jî wan sûdê werbigirin. Helbet dê kêmasiyên wan hebin. Lê aliyê wan ê serkeftî zêdetir e. Lewra van hevalên hêja bîyî xwendineke seretayî û lîsansa kurdî rasterast dest bi masterê kirine û di encamê de jî tezên xwe bi kurdî nivîsandine. Herwiha materyalên li ber destan jî kêmtir in û hin mamosteyên ku wan perwerde kirin jî bi gelemperî ne xwedî zanîneke kûr in di warê kurdî de. Loma divê piştgirî jî bo van xebatan/ xebatkaran bête kirin, tezên wan baş bîne rêvebirin, şewirmendên wan divê baş bîne bijartin û jî kesên xwedan erk û ehlan bîne neqandin. Lewra ev destpêk e û divê destpêk xurt bin. Master çiqas qewî be doktora dê ew qas baş be. Herwiha divê momosteyên tezan jî bêtir berê xwendevanan bidin xebatên qadî. Li ser devokên deveran xebat divê bêtir bîne kirin. Folklorê kurdan roj bi roj dimire. Lewra edebiyata gelêrî li ber dem û zeman û teknolojiyê êdî nikare xwe ragire. Me çî berhev kir, me çî tomar kir kar e û zutirîn wext divê em berê xwendekar û xebatkaran bidin vê qadê. Me niyet kiriye ku di her hêjmarekê de em dê 3 yan 4 tezên kurdî yên pîrlehçeyî û pîralfabeyî di vê kovarê de binirxînin û bidin naskirin. Hêvîdar im ku xwendevan jê sûdê werbigirin û valahiyeke biçûk were dagirtin.

